# GOLIK

HEJMAR 8

Golikê ber dilan natirse ji ga yê malan

Kovara Qerfî Ya Bi Kurdî




www.arsivakurdi.org



# Golik XANE






## DEMBAŞ GOLIKNO!

Di van rojên xumamî de va ye Golikekî me yî nû çê bû.Me dil heye ku em peryoda wî Golikî daxînin jêr û zûtirin derxin mêrga çêrê.

Dema me ev hejmar amade dikir li Kobanê pevçûnen dijwar dıqewimin. Dılê me di destê me de guhê me li ser nûçeyên ajansan bûn.Çeteyên DAIŞ e Kobanê dorpêçkiribûn û şervanên Azadiye bi qehremanî berxwe didan.Rûmeta gelê me bilind dikirin.Çeteyên hov li ber çavderiya dinyaye dıxwestin komkujiyekê pêk bînin.

Duh Şengal îro Kobanê…..

Vê hejmarê em diyarî berxwederên Kobanê û gele me yî tekoşer dikin.

Bi kefxweşiye ve bixwînin.

GOLIK

## Golik NAME

Golik wêjaya Kurdan e
Dermanê xem û jan e

Xêz û henek û ken e
Xwedî wejeya resen e

Nûkteyén wé wek şujin
Neyarî gel dikujin


Başî xirabî jiyan
Golik dixe ber çavan


Hem kêf û hem şadî ye
sembola Azadî ye


Kesê Golik bixwîne
Xem û derdî namîne

Wêjeya ku bê Golik
Wek mirovî bê totik

Salah










# ZIRT XANE

GOLIK 3

OMER RAMAN





GOLIK

# PONIJÎN

Hemed GERGERÎ





## Serxweş û Pasdar

LI WELATÊ ÎRANÊ VEXWARINA ERAGÊ QEDEXE YE. ÎNSANÊN KU ERAGÊ VEDIXWIN DIÇIN PARK AN JÎ DERÎ BAJÊR CIHÊN METRÛK DE BI DIZÎ VEDIXWIN.


ROJEKE ZILAMEK JI BO VEXWARINA ERAGÊ DIÇE GORÎSTANÊ. LI BER GOREKÎ RÛDINE BI DIZÎKA ERAGA XWE VEDIXWE. JI NIŞKA VE PASDARÊN ÎRANÊ TÊN ZILAMÎ DIBÎNIN. PASDAREK BI TUNDÎ JI ZILAM RE DIBÊJE:


— TU LI VIR ÇI DIKÎ?

ZILAM PASDARAN DIBÎNE DITIRSE Û DIGRÎ. BI KELEGIRÎ DIBÊJE: — EZ HATIME SER GORA BAVÊ XWE DIGRÎM Û JÊ RE FATÎHAYEK DIXWÎNIM. PASDAR DIBÊJE:

“HEY ZILAM EV GORA KU TU LI SER RÛNIŞTIYE GORA ZAROKEKÎ 6 SALÎ YE, TU KÊ DIXAPÎNÎ?

ZILAM DIBÊJE: “TU RAST DIBÊJÎ LÊ BELÊ BAVÊ MIN 6 SALIYA XWE DE HÎNA ZAROK BÛ MIR.











Bi Ajalân re Felsefe
Ez dereve kê dikim çermê min diguhere sor dibe, lê siyasetmedar ew qas derewan dikin çermê rûyê wan sor nabe!
Yê ku bêje û bike mêr e, yê ku nebêje û bike şêr e, yê ku bêje û neke kerê nêr e! Mirovek
Ger dinê de mirovê ker nebana ker dê bi rûmet bana!
Insanên ku me zêdetir sernixûn ji hene, lê ê me navê me derketiye. Destê şivanên wan de tifing hene yên me de ço hene!
Di zimanê Kurdî de navên herî zêde yê min in.
Na, yên min in!
Kalepîrên Kurdan çi rast gotine: "Ne ji ewanan ba rovî dê biçûbana sûkê.
Dayikno! Êdî zarokên xwe mexapînin, mebêjin "leglegan tu aniye" Bêjin me azweriyên xwe zeft nekir em li hev şabûn tû çêbû. Mê ji eware mekin.
Mirîsk heka dike qajînî li dîk dikeve.
Ez her dem şiyar im ne wek mirîskê xewar im. Dibêjin mirîsk di xewa xwe da qût dibînin
De here Dîko! Kes bı sela nabe mela
Bêbextiyê li min dikin (iftira) dibêjin evî çêlikê xwe xwariye, giştik derew e. Yekî mîna min i hêstewar wê çawa çêlikê xwe bixwe!



SERPÊHATIYÊN BEKIRO
Mam Gatafîks Kurd û Xalgayiyan birayekin. Kurdîstan di şerekî giran da ye. Divê tu jî wê şiruba xwe ya héz û quwetê dide mirov bide me ku em li hember dıjminên xwe Erep, Ecem û Rom'an bikaribin şer bikin.
Ka... Ez... Em birayeke... Bila be.
Hinek catirî, piçek miza kera, hingiv hineki jî quzilqurt...
Piştî azana sibê kevçiyekê çayê têxin şorba nîskan û vexwin.
Kuro Bekiro tu tam bû ye siyasetmedar haa!
Saliho ma heya kengê em ê der siyasetê, bi mînin kundirê vala!
Gatafîks te çi da birayên me yên Kurd?
Ne tişteke Obîliks. Dema wê şirubê vexwin dê çikên wan rabe û wê zarokên wan zêde çêbibin. Hi hi, hi!
Saliho welehî min bêriya diya zarokan kir lo. Ax Ax! xerîbîyê
Bekiro ka kera me te li ku derê girêdabû, hinekî îşe min pê heye lo!..
Rauan

















www.arsivakurdi.org





# Kefkanî

Ûsiv Amed















www.arsivakurdi.org

# Timtêl


## Ahmet Bilge
















www.arsivakurdi.org




# Misas

A. Bîlge

Min beriya nizanim çend salan di gotarek de xwendibû. Qala gotubejên kor û beredayî dikir. Ji gotûbêjên nav fileh û misilmanan du mînak dida:

Digot fileh bi sedan salan gotubêja perçeyê jêkirî yê ku ji ber sineta Hz Îsa maye kirine. De îca nebêjin perçeyê jêkirî ci ye û min gunehkar nekin. Ha dibe ku hinek xwendevan bibêjin "Di nav fileyan de sinet tune ye." Rast e. Lê em zanin ku di nav cihûyan de sinet heye û Hz. Îsa bi xwe ji cihû ye.

Fileh vê gotubêjé kirine: "Gelo dema ku Hz. Îsa hilkişîyaye jor -ji xwe dinya alem bi vê rastiyé dizane- ew perçeyê jêkirî yê biçûk jî hilkişîyaye jor an na?"

Misilman ji vê gotubêjê kirine: "Gelo dema ku misilmaneki kevan vezeland û tîr avéte kafirekî – weke hûn jî dizanin kuştina kafirekî, guneh nayê dîtin- û dema ku tîr li hewa be ew kafir bibe misilman, wé demê misilmanê ku tîr avêtiye dibe gunehkar an na?"

Di nav van gotûbêjan de kî dizane çiqas gelemşe derketine?

Belkî hew bi ji réderketiné sûcdar kiribûn.

Belkî hew bi gunehkarîyê kafirîyê sûcdar kiribûn

Belkî jî hinek ji wan bi "edelata" şerîetê an jî engîzîsyonê serî ji hustu kiribin

Divê ku hinek ji we bêjin, "Ma çawa bûûû?...


Heyran qet wusa nebêjin wekî ku Dostoyevski jî dibêje; "Tu tişt mîna heqîqetê mirov naheyirîne"!


Em berê xwe qet nedin fileh û misilmanan û meselê jî xwe dûr nebînin. Bi vê meselê min xwest ku hinek balê bikşînim ser gotubêjên navxweyî nav çepgiran.






www.arsivakurd.org


Seyda@live.se



















www.arsivakurdi.org



# Gernas NENAS
## The Quzilqurt

"Yarê ji min re maçek şand, min di q*la DAÎŞ de gulek çand...."

Yanî li ciyekî mirin hebe û tu wekî keran bidî çargaviyan ber bi mirinê bibezî wê ji te re bibêjin çi‡ Bibêjin 'Kerê çolê' ‡

Nexêr! Wê ji te re bibêjin DAÎŞ...

Ji bo bihuştê (70 jinên bakîre jî jibîr nekin)ketine şerê cîhadê, diçin wir bi dev dikevin sila gû, wey noşîcan be ji wan re! Ez rabim wî rihê li ber devê wan ku mîna ye q*na mirîşkê biqusînim û bikim doşek balîf dê têra hemû Rojava bike. Lê heram e! Bila balîfam kevir be lê bila ne perçek ji DAÎŞ'ê be! (DAÎŞ e ÇAÎŞ e êdî nizanim çi quzilqurt û keratiya mîrê mirinê ye)

De em dev ji cehş û wehşan berdin, qala birayê me yî 'azad' bikin. Birayê me yî kul i Şengalê hişt komek xinzîr ji xwe re teyrên taûs bibirêşin û perikên wî li dewsê bigerin. Qet negot ez namzetê serokê Kurdistana gewre me û şerm nekir wekî hêştirmeyan serê xwe xiste binê erdê. Erê, serî xiste binê erdê lê q*n li devre ma. Q*na tazî li bin pihînan dimîne birazî!!

Sibê dema gotin "berezanî" ji bo te kesayetiyek çawa ye‡ Ez ê bêjim ez benî, ez ê bêjim ku ji rûyê xwe reştir e. Gotineke Tirkan heye "Tirî li hember tirî reş dibe." Berezanî li hember Ereban reş bûye. Ereb dewsa avê de xwîna me vedixwin, ew petrolê vedixwe 'xwîna me dide vexwarin'. Wey di ber de bimîne, wey di qirikê de neçe xwar . Tu pê zikzerî bibî (Amen)!


Ez vê stranê diyarî wî dikim
"Berzanî Berzanî lê 'b lê gulê lê'b lê gulê lê lêê
Berzanê Tirkan e sîngsedefê , devbiçûkê , çavbelekê
Eyngeverê canê"

Em dev ji van û wan berdin, ev êrîşên li dijî Kobanî tiştek bi me dide zanîn..

Yek; em fêm dikin ku hê jî û hê jî neyarê me yê mezin Tirk in û çi bê sere me bi dile wan e (Sedemli çaraliyê çefiya te
diçirûse şûna şûrê şilfitazî yê DAÎŞA Terorîst
kulora şahmeran e egala li serê te
ev kitana çendan e te li xwe şikandiye hebhinarkê min
lê ne sûcê te ye ,
ew mîratê çeteyan li me nehatin

li çiyayê şengalê,
komek xenzîr teyrê tawiz ji xwe re biraştine
Tirk dikenin li ser wê
tu hogirê van Tirkan bûyî Barzaniyê delal
bi govendê ketine pêşmergeyên te yên firyali
li ser goleke xwînî

ji bo ku ez bi serê te da (bi)kim,
ez ê dojeh bi dojeh li xweliya hestiyên Mele Mistefa bigerim,
hebhinarko; bavê tirsê,
destarê pere,
şivanê petrolê,,,

































- Her xwendevan divê bibe Golikvan!

- Golik dakete meydanan gîha şin


Şiretên PÎRÊ
-PIROLE MEKE JI TE BAWER NAKE...
Ez ji bo te, tu ji bo min çêbûye..
-TÛJ REXNE MEKE JI TE HEZ NAKE.
Tirşikê diya mı, mirov ber re tılıya xwe dıxwar!
TUNE MEHESIBÎNE TE EFU NAKE!..
Min biryar da ku mobîlyaya navmalî biguherînim
?
HALAN (CESARET) BIDÊ WÊ TU CAR TE BÎR NEKE...
Tu her ku diçe li ber çavê min xwesiktir dibe
??
GOLIK
Golikê ber dilan natirse ji gayê malan!


XALÊ CEMÎL
SÎNEMÊ: Qerwaşa nugihayî ye. Li mala Xalê Cemîl dişuxule. Sivika malê ye.
XALÊ CEMÎL: Ji binemala malbateke arîstokrat tê. Berê, xwedî gund û dikanan bûn. Lê niha rewşa aborî ber bi têkçûyî ve diçe.
Di wê rêzexêzêde hûn ê rewşa malbateke arîstokrat Kurd bişopînin...
Te dît wê qerwaşa kerbav çi anî serê me!
Min çend caran ji te re gotibû qîzek wisa xama nabe kewaniya malê.
Dîsa çi bû, çi kiriye? Karê malê nekiriye an zarok birçî hiştine!
Ketiye dolaba min sutyenê min li xwe kiriye
Meke xem xanim em ê çareyeke bibînin
Tu çi dikî malxirabo! Xanima min me di vî halî de bibîne wê me çinî çinî bike
Hiş be dengê xwe meke!.
Dest ji min berde niha nabe... Va ye dengê lingê yeki tê...
Ka bise lê tişt nabe!
Wey lêêê! Tûû li rûyê we!.. rûreşino ev çi rezîliye!..
Şaş fêhm meke Xanim. Min sutyenê te hêdika li ser pêsîra wê re dişimitand wê kêliyê de tu kete hundir!